# ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
# ENSTÎTÛYA ZİMANÊ KURDÎ


# SPARTEK

## Dİ ROMANA EREBÊ ŞEMO YA JİYANA BEXTEWAR DE NÊRÎNÊN ÊZÎDÎYA


**Muaz çetin**

**18721004**

**ŞÊWİRMEND**

**DR. ZÜLKÜF ERGÜN**



**Mêrdîn 2019**

# Dİ ROMANA EREBÊ ŞEMO YA JİYANA BEXTEWAR DE NERÎNÊN ÊZÎDÎYA

**Muaz Çetin***

**KURTE**

Êzîdî alîyê perwerdehîyê di Komara Sowyetê de gelek pêşketine. Di hemû cureyen edebîyata kurdî de berhem dane. Êzîdî di van berhaman de fikrên xwe yên sîyasî, olî û hwd. dane nîşan. Di vê xebatê de armanca me nîşandana nerînên(perspektîvên) Êzdîyan e. Me ji bo vê romana Erebê Şemo ya ''Jiyana Bextewar'' hilbijart. Wek rêbaz di vê romanê de bendên balkêş ku nêrînên êzdîyan eşkere dike me dayê nîşan û me di derheqe van de hin tespît kirine.

**Bêjeyên Sereke:** Êzîdî, Nêrînên Êzdîya, Jîyana Bextewar, Erebê Şemo

***Xwendevanê lîsansa bilind, Zanîngeha Mardîn Artuklu Beşa Ziman û Çanda Kurdî**

# DESTPÊK

Kurd di erdnigarîyek fireh de jîyan e. Çiyayên kurdan li alîyê rojhilata nêzîk û rojhilata navîn hezar û pêncsed kilometir zêdetir dewam dike. Ji bo vê Kurd berî îslamîyetê xwedîyê gelek bawerîyê cuda bûne. Êzîdîtî jî yêk ji van bawerîyan e. Di derheqê çavkanîya Êzdîtîyê de em dikarin li ser du nêrînên rawestin. Li gorî nerîna yekem Êzdîtî dînekî serbixwe ye. Li gor nerîna duyem jî Êzdîtî dînekî têkel e kû ji unsurên dînî yên berî îslamê û piştî îslamê pêkhatîye. (Adak, 2015) Jimarek mêzin Kurd Êzdî bûn. Dema îslamîyet belav bû hin ji kurdan îslamîyet qebul kirin. Lê hin Kurdên Êzdî dînê xwe parastin û heta niha jî Ezîdîtî didome. Di dîrokê de Êzîdî gelek cara ji bo hin sedemên sîyasî, aborî, olî ji destê misilmana zilm dîtin. Ji bo vê yekê Êzîdî her tim li nav misilmanan-kurdên misilman jî navde- di tirsê de jîyan e. Di sedsala bîstan de çend cara fermana Êzdîyan derdikeve. Qismek Êzîdî ji bo van fermana ji dewleta Romê (Tirk) terk dikin. Piştî Şoreja Îlonê di Komara Sowyetê de çedibe Êzîdî derfetên mêzin dest dixin.

Nivîskarê me Erebê Şemo yek ji van Êzîdîya ye. Di Komara Sowyetê di zimanê Kurdî de karên pêşîvanî kirîye. Erebê Şemo demezrênerê edebîyata Kurdî ya Sowyetê ye. Yekemîn romana kurdî a bi navê ‘‘***Şivanê Kurmanca***’’ nivîsîye. Di sala 1897 de li gundekî bajarê Qersê dayîk bûye. Demekê dirêj di komîteya navendî ya partîya komînist a Ermenîstanê de cî girtîye. Di sala 1931 de li Lenîngradê rastî Qanatê Kurdo tê. Li wir dest bi xebeta edebî û zanistî dike. Li navbera salên 1937-1956 ji alîyê Stalîn vê tê sirgûnkirin. Di sala 1978 de li Yerawanê koça dawî kirîye.

Romana Erebê Şemo ya bi navê ‘‘Jîyana Bextewar’’ ji weşanxanê Lîsê ve di sala 2015 de hatîye çap kirin û çapa yêkem e. Roman 279 per e. Erebê Şemo pêşxeberê vê romanê di sala 1959 de li bajarê Yerewanê nivîsîye û li gor vê pêşxeberê romanê çar sala de xilas kiriye.

Li gor rêbazê vê xebatê em behsa çîroka romanê nakin. Bi taybetî di ramonê de cihên balkêş ku nêrînên ezdîya eşkere kirîye hatiye tehlîl kirin.

## 1. NÊRÎNA Lİ SER BÛYÎNA KURD

Di vê romanê de beşa bi navê ''bindarûk'' behsa tekîlîyên kurdên misilman û êzîdîya dike. Di vê beşê de weqta havîn dest pê dike xortên ji êla sîpkan wek edet diçin bindarûk û keyf dikin. Ebdilmecît weqta bi hespê xwe re li nîzîkê bindarûkê dibure çikas bavê wî bûyê misilman jî qurapên wî bang dikin ku were li nav wan. Tu ferqîtî nakin. Ebdilmecît we rojê şa dibe. Ebdilmecît di gund de gelek cara wek ''bavêzdî'' tê bang kirin û ew ji bo vî tiştî gelek diqehire. Diçe cem dê û bavê xwe sedemê vê tiştî dipirse. Dê û bab vî şeklî bersivek didin.

> **Bavê kur hemêz dikir digot:**
> **-Lawo bila bibêjin, Êzdî jî Kurmancên mîna me ne, ew jî dîsa eşîra me Zîlani in, her dînê wan cuda ye. Em ji van qetîyane hatine ser dînê Mihemed, ser dînê Îslamê.**
> **Dêya wî…kurê xwe re gilî dikir:**
> **-Lawo, mezinên ji me re digot; Xwedêgiravî berê Kurmanc li ser dînekî bûne, wexta Ereb û Rom hatin, bi zora şûr Kurmanc tev kirine Îslam.**
> **….yekê ji kur re digot:**
> **-Ew jî kurmanc, em jî kurmanc. Merivên dîwanê dihatin, ew ji wan re jî dibejin Kurd, ji me re jî dibêjin Kurd. Şêxên wan hene, şêxen me jî hene. (Jiyana Bextewar, s. 14,15)**

Heta sedsal bere jî Kurd nasnemeya xwe ya olî danîne pêşî nasnemeya netewî çi îslam çi ezdîtî. Ji bo vê jî li navbera Kurdê misilman û êzdî her tim dûrbunek heye. Kurdên êzdî li nav dewletê misilmanan de jîyane. Ji cudatîya olî ve gelek tade ditîne. Di bendeya jorî de jî tadeyek derunî heye. Nivîskar li gor benda jor ***nasnemeya netewî*** pêş dixe. Çi Kurdên Êzdî çi kurdên misilman li navbera wan de zêde ferq tune. Kurd di ziman, çand, edet de wek hev e. Ferqa olê ne ferqek mêzin e. Divê kurd ferqîtî li ser olê nekin û nexin mijarek cûda bûn e. Heta ev ola îslamê ku kurda cuda kiriyê karê ereb û tirkan e. Kurda xistîye du perçe. Fîkra netew ji xwe fîkrek ji serdama mordern e. Nivîskar jî bi vê nêrînê peyama xwe daye.

## 2. NERÎNA Lİ SER ROMÊ(TİRKA)

Êzîdî Romê dijminê herî mêzin dibînin. Dibe ku di romanê de herî zêde tê dubare kirin zilm û tadeya Romê ye. Çend sedemên vî neyartîyê evin. Yekemîn sedem misilman bûna Romê ye. Êzîdî ji misilmana gelek tade dîtîne. Duyemîn sedem jî dagirkerîya Romê ya Kurdistanê ye. Ev sedem piştî modernîsazyona Êzîdîya xurt tir dibe. Çimkî Ezdîyên wek Erebê Şemo edî nasnameya peş Kurdbûn qebul dikin. Seyemîn sedem jî dijmintîya Romê ya bi Ûris e. Êzîdî wexta ji Romê direvin. Ûris haj Êzîdîya dimînin. Ji bo vê yekê Êzîdî hez Ûrisa dikin û her awayî piştgîrî didin. Di romanê de hin bendên derheqa Romê ev in:

> **…Kurd ji van rojan ketibûn talaşa şer, tefekurî dikişandin, dîgotin: ''Xwedê textê Sultan Hemîd wergerîne, wekî wî koka Kurdên belangaz anî, em talankirin…Xwedê neke em dîsa têkevin destê qeymeqaymê Romê, Zabitêd wan milazimêd wan. Ew zilmkar in.'' (Jiyana Bextewar, s. 98)**

**…Ev gundêd Kurmanç tev Romê xirab kir, wekî li vê derê nemînin. Kurd ji cîyê xwe nedileqîyan, lê ew hatin gundên wan xirab kirin bi zora qamçî dan barkirin…Lê Rome dijminê Kurdan e, wekî me zexîreya Romê bianîya, niha çend caran hatîbûn kutan. Padşayê Romê bi zorê dîxwazê Kurdan wergerîne têke Rom, wekî Kurd tune bin. (Jiyana Bextewar, s. 100)**

**…Weleh ji berê de mezînên Kurmancan gotine:''Rome xayîn e, Rom bêîtbar e.'' (Jiyana Bextewar, s. 101)**

**…Casusê Romê bi destê ruhanîya dîndijminî dikirin orta Kurmancan, digotin:''Ev Êzdî ne, ev misilman in.'' û berî hev didan. (Jiyana Bextewar, s. 137)**

**…Casusên Romê bûn, wan milletî û dîndijmînî dikirin nava mexlûqetên Kurd û Ermenî. (Jiyana Bextewar, s. 144)**

**…Wî dilê xwe de got:''Kulê tu bi min de bê yî, van li welatê Romê koka Kurmancan anî, livan deran jî evin teşkîl dikin, serê rêya digirin, merivan dişêlînin û dikujin, miletan berî hev didin. (Jiyana Bextewar, s. 146)**

**…Biçûk û mêzin zanîbû cîyê qanûna padşayê Romê, li wê derê ji bo jîyana kurdan qetl e… (Jiyana Bextewar, s. 155)**

**…Padşayê Romê bi eskerên xwe ve ketîbûn nav gundên kurdan, mîna qesabên bajarine giran, pêz ser jê dikin, wekî bajê têr bike, lê bajêr têr nabe. Qumandarê Romê jî wîsa roj bi roj mêrîv qir dikirin, lê jî xwîna merivan têr nedibû, dikuştin biçûk û mezin, heta zarêd ber bistanê de jî qir dikirin. (Jiyana Bextewar, s. 161)**

**…Çimku Romê hat bi zora silahê welatê me zeft kir, em derxistin ser çîya û kir mîna qûlan (Jiyana Bextewar, s. 174)**

**…Wê caxê padşa û şah tîmî eşîrêd kurdan berî hev didan, dubendî dikirin orta wan, wisa dikirin, wekî ew hev du negirin. Digotin:''Ev zaza ne, ev Êzdî ne, ev Elî-alahî ne, ev Sunî ne (Jiyana Bextewar, s. 208)**

**…Hîtler jî bêînsafekî mîna wî padşayê Romê ye. (Jiyana Bextewar, s. 267)**

Dîsa di romanê de li ser zilma Rome cihe herî balkeş xwestina ***''dîş kîrasî''*** ye. Mala Emerîk li nav êla sîpkan de peşîvanî dike. Ji bo vê yekê weqta ku Silêman beg, milazim û qeymeqamê Romê tê êla sîpkan dibin mêvanê Mala Emerîk. Ew du roj mala Emerîk dimînin. Milazim û qeymeqam ji bo şerê Romê zaxîre, nan, goşt dixwazin. Wexta çuyînê Silêman beg ji Emerîk ''dîş kîrasî'' dixwaze:

**…Emerîk milazim ji Stenbolê hatîye, tu zanî, wekî pê nanxwarinê re tu gerek ê dîş kîrasîyê bidêyî, lê dîş kîrasîyê wisa bidêyî, wekî milazim ne xeyîde. Li Stanbolê jî navê te li cem padşê bilind bike. Qeymeqam jî hemî merîvê me ye, li cem me ye, timî bi kerî te tê. Ew jî gerek ê bêpar nemîne, rojed çetînayîyê û tengasîyê wê bi kêr te bê. A min jî tu zanî, ez çi bejim, ez begê te me…**
**…Emerîk dilê xwe de got:''Hûn hatine me talan bikin, her sal her gav halê me ev e di destê we de.**
**…Ewana ew qas pez, genim ji me stand, ewqas me hurmet, îkram, mesref ji wan re kir, hê dawa ''dîş kîrasî'' ji me dikin. (Jiyana Bextewar, s. 34,35)**

## 3. NÊRÎNA Lİ SER HEZKİRİNA ÛRİSAN

Piştî çuyîna Evdilhemîd, Jon Tûrk hatin ser dewleta Osmanîyan û paradîgmayek nû çêkirin. Li gor vî paradîgmayê nîştecîhên vî welatî divê Tirk, misilman, sunnî bin. Kesê ku vî qebul neke. Cihê wî an binê axê ye an jî sirgûn e. Êzîdî di vê pênaseye de nînin. Çawa ku fermana ermenîyan hatîye kirin, ferman Êzîdîya jî hatîye kirin. Piştî ferman Êzîdîya gelek Êzîdî ji welatê xwe koç bûn. Çûn Ermenîstan û Ûris ê. Ev malbetên Êzîdî ji tinebûne bi xera Ûrisan xelas bûn. Li wir Êzîdî li gor Romê rehet tir jîyaye. Ji hizmeta dewleta Urîs sûd hildaye. Ji bo vê yekê Êzîdî alîkarîya Ûrîs bîr nakin û her tim tînin ziman (Ergûn, 2017). Wexta herba yekemîn Urîs bi Romê re şer dike û Êzîdî piştgirî didin Ûris. Erebê Şemo hêj peşxeberê romanê de vî şeklî tînê ziman ''Ûrîs maxlûqetekî pak e, xêrxwaz e û qencîya miletê Kurmancan dixwaze''. Hin mînakên din evin:

**…wekî çend salan berê Ûris hat…Pak tê bîra min, wekî şîr jî malan dibirin, dîsa bipere bû. (Jiyana Bextewar, s. 37)**

**…''Bila şûrê Ûris bira be, bila winda bibe sultanê Romê yî zilmkar''…Mexlûqatê Ûris pak e û birehm e. (Jiyana Bextewar, s. 98)**

**…''Ev çend sal in me pak û rihet derbas dikir, miletê Ûris miletekî zafî xerîbdost e û ne dijminê Kurdan e. (Jiyana Bextewar, s. 159)**

**…gava ku deng hat, wekî eskerê ûris tên, şabûn ket hemû gundên kurdan (Jiyana Bextewar, s. 178)**

## 4. NÊRÎNA Lİ SER XWENDİNÊ

Romana Jîyana Bextewar alîyê demê ve gelek dirêj e. Roman berîya herba yekemîn a dinyayê dest pê dike heta di sala 1941 didome. Koç bûna Êzdîyan, herba yekemîn a dînyayê(şerê emperyelîstîyê), şoreşa îlonê û herba duyemîn a dînyayê(Şerê wetanîyê) hin bûyerên muhîm in di vê romanê de. Êzdî di vê çil-pêncî salan de gelek cih dugeherînin û dinyayê de guherînên gelek muhîm çêdibin. Êzdî jî dikevin bandora van guherînan û piştî van salan êdî hin tetbîqên dînê xwe rexne dikin. Meseleya xwendinê yek ji van e. Beşek di romanê de bi taybetî li ser vê

meselê disekine ku navê beşê ’’xwendin guneh e’’.  Di romanê de li gor Êzîdîtî we çaxê xwendin guneh e. Ev tişt di romanê vî şeklî tê rexne kirin:

> **…terêqên me jî dibejin:’’Xwendin guneh e.’’ Nizanin çima ji hemû miletan re ne guneh e, her ji me re guneh e? Bi aqilê min ê ku xwendin ji mere kirîye qedexe, ew dijminê me ye. Wî çima ew tiştê pak kiriye qedexe? (Jiyana Bextewar, s. 201)**
>
> **…dî gunde me de Şex şemo hebû, golikvanê gundê me bû, kurê wî zimanê ûrîsî xwendibû, çima xwendin ji şêx re ne guneh e, hema ji mere guneh e. (Jiyana Bextewar, s. 207)**

Di pelên dawîyê de Sehîdê kurê Emerîk derfetê xwendine dest dixe. Heta dîplomeya ulme pêdagogîyê distîne.

## 5. NÊRÎNA Lİ SER AZADÎBÛNÊ

Li gor vê romanê Êzdî weqta ku serbixwe bin şadin. Li nav gund, çîya û zozanan de dixwazin bi azadî bijîn. Golik û bazên wan divê bi azad biçêrin. Peşîya romanê mirov vî tiştî dibîne. Xurt li bin ‘’bindarukê’’ de ji xwe re direqisin û strana dibêjin. Dinê bahar e. Her tişt bi nû ve ji xewê hişyar dibe. Tu pirsgirek û nexweşî tune. Êzîdî bi çand û dînê xwere şadin. Her der tijî ronahî ye.

Êzdîtî nasnameyek hezar salan e. Ji bo ve yekê li gor min ne tinê welatê Romê, Ûrisê jî Êzîdî xwe tim azad nabîhîsin. Çikas jiyan di Ûris de xweştir be jî hin kemasî hene. Ne li gor keyfa xwe dijîn, mecburun li gor sîsteme Uris jiyana xwe didomînin. Her tim jîyanek serbixwe dixwazin lê ev tu cari peyda nabe. Ji bo vê yekê Êzdî her tim derûniyek xirab de ne. Tirsê de ne.

# ENCAM

Me di  romana Erebo Şemo ya Jiyana Bextewar de nêrînên Êzdîya nîşan kir. *Romê, Ûris, Kurd bûn, Xwendin, daxwaza azadîbûnê*  hin ji wan bûn. Li gor van em dikarin bêjin ku ev nêrîn bi dîroka Êzîdîya ve girêdayî ye. Kurdên Êzdî komek lawaz e. Kurdên misilman çikas ji netewa Tirk, Erep, Faris cuda bin jî, ji bo hebûna heman mezhebê (sunnî bûn) wan heta astekî parastîye û hin caran bûne hezek sîyasî û eskerî jî. Lê Êzîdî wek misilman ne hatîye qebûl kirin. Ji bo vê her tim şik û tirsê de jîyayê. Gotinek hey dibêjin Ezîdî tu carî bav û bapîrê xwe heman cihê ne weşartine. Beşên ***Kurd bûn û Xwendin*** bi fikrên nûjên ve eleqadar in. Piştî Ezîdî diçin Ûrîs li wir fîkrên modern bandora wan dike. Edî bi çavekê nû dinyayê dinirxînin.

# ÇAVKANÎ

Adak, A. (2015). *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk.* Îstanbul: Nûbihar.

Ergûn, Z. (2017). Ducemserîya Realîzma Sosyalîst Di Romanên Erebê Şemo û Hecîyê Cindî de. *e-Şarkiyat Ilmi Araştirmalar Dergisi*, 644-661.

Şemo, E. (2015). *Jiyana Bextewar.* Dîyarbekir: Lîs.